# Agahdarî ji bo dayik û bavan derbarê xwendina ji bo zaro-

Dayik û bavên bi rêz,

Xwendina bi hev re û temaşekirina pirtûkan hemî zarokan kêfxweş dike. Zarok gelekî ji çîrokan hes dikin. Dema ku merov çîrokan ji wan re dixwîne, ew bi vî rengî fêrî guhdarîkirinê dibin, baş fêrî axaftinê dibin û piştra baş fêrî xwendinê jî dibin.
Tu dikarî di rêya vê pirtûkê re tevî malbata xwe jiyana rojana ya Almaniya nas bikî û fêrî peyvên destpêkê di zimanê elmanî de bibî. Em hêvîdarin, ku tu û malbata xwe demeke xweş û geş bi xwendin û gotina çîrokan re derbas bikin!

## Naskirina Jiyana rojana li Almaniya

Bi zaroka xwe re derbarê wêneyên di pirtûka „Hun bi xêr hatin, Bär Nadim!“ de biaxive. Hêdî merov yekser dikeve nava axaftinê: Merov dikare çi li baxçe, li supermarkêtê yan li ser rêya trafîkê bibîne?

## Peydakirina gotinên almanî yên pêşî

Tu dikarî di pirtûka wêneyî de herweha li ser her rûpelekî çend gotinên elmanî yên li gorî wêne peyda bikî. Tu dikarî bi vî rengî tevî zaroka xwe bi lîstikane gotinên elmanî yên pêşî peyda bikî û ferî wan bibî.

## Xwendin û Gotina çîrokan

Dema ku tu ji zaroka xwe re bixwîne, ew bi vî hawî fêrî axaftinê dibe û fêr dibe, ku hestên xwe derbirîne û bala xwe baş bide ser tiştan. Ji ber ku xwendin ji bo zaroka, bi çi zimanî be bila bibe, nêzîkbûnê di navbera dayik û bav û zarokan de peyda dike. Xwendina bi hev re û gotina çîrokan li xweşiya zarokan tê û gelekî giring e ji bo fêrbûna xwendinê!

Bernameya „Xwendin me pêşve dibe. Destpêka xwendinê ji bo zarokên penaberan“ ji aliyê dezgeha alîkariyê Lesen bi fermana wezareta federal ji bo xwendin û lêkolînê tê cîbecêkirin.

**Demeke xweş ji bo xwendin û gotina çîrokan!**

www.lesen-bringt-uns-weiter.de

Lesestart für Flüchtlingskinder

EINE INITIATIVE VOM Bundesministerium für Bildung und Forschung

Stiftung Lesen